# NAMAK JI BO NÛNERTIYÊN DÎPLOMATÎk Û SIYASÎ Û JI BO RAYA GIŞTÎ

# PÊNC SAL JI DIJBERÎKIRINA TURKIYÊ LI SER EFRÎNÊ

**Wergerandin ji Erebî**

Li 20.1.2018an. Z, bîranîna pêncemîn di ser dijberîkirina Turkiyê li ser Herêma Efrînê ya Kurdî ya Sûrî re derbas dibe; Ewa ku bi pişikdariya Milîseyên Sûrî yên nandoz di bin navê "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" ya girêdayî "Hemahengiya Sûrî ya hêzên şoreş û rikberiyê", "pîrozkirinek ji Yekîtiya Islamî ya Sûrî - Istanbûl", xwendina /90/ hezar îmam û xoceyên di mizgeftitên Turkiyê de ji "Sûreta El'fetih" re bi biryara "Weqfa - Diyanet", û herweha bi karanîna hemî cûreyên çekan ên bejayî û asîmanî pêk hatî, ta dagîrkirina herêmê bi tevahî li 18.3.2018an. Z.

Êrişê di kêlîkên pêşî de bi bombebarankirina /108/ armancan ji aliyê /72/ balafirên cengê ve (yên ku ji erdên Turkiyê derketine) dest pê kir, di navboriya/58/rojan de binevahî, cîgehên giştiyane û saziyên xizmetguzariyê (av, nanpêjgeh, dermankiringeh, naxweşxane...) armanc kirin, nişteciyên herêmê mişext kirin û bihezaran mal roxandin, bi ser de jî armanckirina sivîlan û pêkanîna komkujiyan di dermafê wan de, û hejmara qurbaniyan /5/ hezar kuştî û brîndar derbas kir, herweha jî cîgehên kevneşopî û zanişwarên geştiyarî armanc kirin, da ku herêm di dema dijberiyê de tevgereke penaberiyê ye mezin bibîne.

Ji roja yekê ji dagîrkeriyê ve û ta niha, tewan û binpêkirinên bi robet di dermafê xelkê herêmê de pêk tên, û di vê karnavê de dora /275/ qurbanî ji sivîlan -di nav de jî zarok û jin- çêbûn, wan an bi kuştinê yan mirina di mercên têvel de (di bin işkencê de, yan bi qurşînên jîndar û teqîner û bombeyên zemînî, yan bi îdamkirinê û yan jî bi bombebarankirina herêmên penaberiya koçberên Efrînê li gund û Bajarokên Şehba'i...) jiyana xwe ji dest dan, ji bilî yên ku di bin zext û fişarên derûnî û mercên jiyanî yên sert ên dagîrkeriyê de mirine, ji bilî dora /500/girtî yan revandî - zorane veşartî.

Herêm rastî pirosyeke guherînê ye demografî ye rêbazkirî û fere hat, di encama dijberîkirinê de bêtirî /250/ hezar nişte ji niştecîyên resen hatin koçberkirin, da ku rêjeya Kurdan li herêmê ji dora 95% dakeve kêmtirî 25%, piştî niştecîkirina dora /500/ hezar nişte ji malbatên çekdar û anîndeyan ji parêzgehên din, di navboriya kêmtirî du salan de piştî dagîrkirinê, û avakirina gundine niştecîbûnê yen nimûneyî di bin navên mirovahî û fîxaniyê de û bi pereyên Qeterî, Kiwêtî, Fîlestînî û Turkî.

Di dû ketina herêmê yekser de, giropên çekdar ên pişkdar di dijberîkirinê de dest bi piroseyên talan, dizîn û tarûmarkirina malmewdanên taybet û giştî (mal, dîkan, embar, aliyet, acet, dibistan, nexweşaxane û saziyên xizmetguzariyê, û ta dewar, pez, mirîşk û tilûran...) kirin, dest danîn ser dora /100/ hezar (zeviyên zeytûna, erd, mal, dîkan û çêkergeha tevî heyînên tê de), ta roja îro werzan didizin û talan dikin, vêrgiyan ferz dikin, û ji bo êzingkirinê û çêkirina komirê û pêbazirganiyê daristan û zeviyên darên zeytûnan ên temenmezin qut dikin; Herweha jî ew ji bo lêgerîna li kevneşop û kinzan û dizîna wan hemî gir, cîgehên dîrokî û zaretgehên olî kolandin û rêşkirin; Û bi ser de jî tûşîkirina niştecîyên resen ên mane ji cûrbecur binpêkirin û tewanên têvel re, mîna: Kuştin, revandin, veşartina zorane, girtina bêsûcane, peresitandin û hin kiryarên din, bi tuhmetkirina wan bi tuhmetên çêkirî (bi kêmanî têkildariya bi rêvebiriya berê re); Ew hemî jî di bin serpereştiya Istîxbaratên Turkiyê de bi rengekî rêbazkirî têne kirin.

Kurdên Êzdî -zaroyên herêmê- rastî koçberkirina zorane û bindestkirina olî hatin, herweha jî ji karanîna bîr û bûçûn û silogan û gerdîşên xwe yên olî yan lidarxistina şahiyên cejnên xwe hatin

qedexekirin, û tarûmarkirina mebestkirî gihîşte zaretgeh û goristanên miriyên wan, di heman dema ku çalakiyên olî yên Islamî li herêmê têne kirin, û korsên lezberkirina "Qur'anê" û dibistanên derçûnkirina "Îmam Xetîb" têne li darxistin.

Rewşke ji geregoşî û serberdayetiyê, tunebûna ewlehiyê, belavbûna rûdana hilgirtina çekan ji aliyê anîndeyan ve -ji bilî çekdaran- û bi karanîna wê bi awakî tewşankî, û pevçûn di navbera milîseyan de û ferebûna desteserkirina "Desteya Tehrîr Elşam - Eniya El'nesre" li ser erdnîgariya herêmê, di bin çavdêriya Artêş û Istîxbaratên Turkiyê de serwer dibin.

Turkiyê Ziman û Çanda Kurdî qedexe dike û li ser jêbirina kevnetora herêmê û pişaftina nasnama wê ya Kurdî kar dike, û bi riya ferzkirina Zimanê Turkî di dibistanan de û vekirina navendên çandî, dîrok û destkeftiyên Osmanî berz dike.

Koçberbûyên Efrînê li herêm û çadirgehên Şehba'i û Bajarê Heleb di siya mercên jiyanî yên zor çetin de du te'iliyan dikêş in, ji alîkî ve di navêna rêbendên Rijîma Sûriyê û rêbendên çekdarên Hemahengiyê de dorpêçkirî ne, ne fîxana navdewletî û ne ragîhandina azad dighêje wan, û herweha jî ew ji vegera bo cîwarên wan qedexekirî ne, bi sedema nepeydabûna mercên nizim ji vegera biewle.

Desteserkirina rastîn a Turkiyê li ser Efrînê dagîrkerî bi xwe ye, lê ew ji berpirsiyariyên xwe yên Rêzanî û zagonî dide yal û direve, û li gor peyman û belgeyên navdewletî bi erk û stubariyên xwe pabend nabe, û hîn dorpêçkirin û serveşartineke ragîhandinî jî li ser herêmê ferz dike, da ku rûbera herêmê ji xelkê wê re bike hepis û zîndan.

Bi vê boneyê careke din em şermezekirina xwe ji dijberîkirina li ser Efrînê û dagîrkirina wê re şermezar dikin, û em tewanên rojane yên ku ji roja yekê ve û ta niha nesekinîne ne'ilet dikin, a ku ji xweberê digihêje asta tewana li dijî mirovahiyê.

- Em bang li Neteweyên Yekgirtî û rêkxirawên navdewletî dikin, da ku li hember dewleteke ku tundûtûjiya destlatê û tundûtûjiya beramber wê dihêre -navê wê Sûriyê ye- bi erkên xwe rabin, û dergeheke Rêzanî jêre bibînin, da ku geregoşî û serberdayetiya heye û rêtina xwînê bi dawî bikin, û herweha jî li hember cihekî ji zemînê jibîrbûyî navê wê "Çiyayê Kurmênc" e - Efrîn, Ji alîkî ve Rijîma Şamê dest jê berda û paşguh kir, û Turkiyê jî baxşand kêmhiş û cîhadîstan, da ku pê û bi jiyana xelkê wê bilîzin û serbinqotî hev bikin, û dibe jî paşê ji wir de piroseyên terorî li dijî mirovahiyê pêk werin.

- Zext û fişar li ser Hikometa Anqerê were kirin, da ku artêşa xwe vegerîne sînorê navdewletî, berdêlkirina ziyanên ji ber dagîrkirina Efrînê û herêmên din ên dagîrkirî derketine, û berdêlkirina ziyandîtiyan û kar ji bo pêkanîna vegereke bi'ewle ji ķoçberan re.

***- Azadî ji girtiyên bêsûc û veşrtiyên zorane re.***

***- Vegera Xwebexş û bi'ewle ji yên ku ji cî û warên xwe koçber bûne re.***

18 Rêbendana 2023an. Z

**Desteya Rêvebir A**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**